

Zanyarî ji boyî te ku wê jêhatinên xwe tomar bikê

Ev hin zanyarî ne ji boyî te ku li kempa entegrasyonê dijî û tê zanyariyan liser jêhatinên xwe tomar bikê.

Destnîşankirina jêhatinan beşek e ji naveroka pêdivî di programa tam-demî de, û beşek e ji lihevhatina akincîbûnê li kempa entegrasyonê. Divê tu jêhatinên xwe tomar bikê da ku tu baştirîn rêberiyê werbigrê liser xwendinê û kar li Norwêc, û ji boyî ku derfet hebê programeke tam-demî ji te re werê pêşkêşkirin. Netomarkirina zanyariyan wê encamên wê hebin liser te û liser bicîanîna mercên lihevhatina kempa entegrasyonê. Netomarkirin wê her wusa giring be ji karê IMDi re ji boyî peydakirina şaredariyeke lêbicîbûnêyî minasib ji te re.

Çima giring e ku tu jêhatinên xwe tomar bikê?

Li Norwêc gelek desthilatdarên giştî (hikûmî) hene ku kar dikin da kû kesan di derbara xwendin, rahênan û kar de şîret bikin. Ew mehtêcî zanyariyan in liser jêhatinên te da ku bikaribin te bi baştirîn şêwe şîret bikin.

Eger te mafê mayinê li Norwêc standibe û tê bi alîkariya desthilatdarên giştî werê bicîkirin li şaredariyê, wê demê zanyariyên derbara jêhatinên te yek ji wan faktoran e ku IMDi berçav digre di dema hilibijartina şaredariyeke minasib de ji te re.

Zanyariyên li ser jêhatinên te wê pişt re bêne bikaranîn da ku şîretkirineke li gorî te derbara kar, armanca dawîn û naveroka programa amadeyî a te de bidne te.

Bingeha qanûnî ya çarekirina zanyariyan

Te lihevhatina beşdarbûnê di programa tam-demî de weku akinciyekî kempa entegrasyonê emze kiriye. Ji boyî tu armanca vê lihevhatinê bi cî bînê, giring e ku tu zanyariyan derbara jêhatinên xwe de tomar bikê. Bicîanîna mercên vê lihevhatinê bingeha qanûnî ye ji boyî çarekirina zanyariyên derbara te de. Ligor xala 6 an hejmar 1 tîpa b ya mersûmê giştî derbara parastina data-yan derfet heye ku zanyariyên te bêne çarekirin dema ku ev tişt giring bê ji boyî bicîanîna mercên lihevhatina ku bi kesê tomarkirî re hatiye emzekirin.

Zanyarî li ser ferehiya tomarkirinê

Di dema tomarkirina jêhatinên te de, wê zêdetir zanyariyî liser te neyêne danehev ji wan zanyariyên ku têne danehev liser kesên ku mafê mayinê wergirtine û ji ber vî tiştî ew hem mafdar û hem jî erkdar in ku jêhatinên xwe tomarbikin.

Ew kesê ku wê di dema tomarkirinê de te rêberiya te bike, dikare hin hûrgiliyan di malikên têksta serbest de binivîsê bi mebesta timamkirina zanyariyên ku tu di Kompass de tomar dikê. Di malikên têksta serbest de, wê şêwirmend tenê zanyariyan li wan xalên ku di Kompass de hene zêde bike.

Kîjan zanyarî li ser te di Kompass de têne tomarkirin:

- Hevwelatîbûn, zayende (cins) û temen

- Zimanên ku tu dizanê
- Xwendina dibistanê / xwendina bilind
- EzmUna (xibreta) kar
- Te berê çî çalakî dikirin ku ji xwendinê û jiyana kar re tekildar in
- Mijûliyên te
- Daxwazên te derbara xwendinê û kar de

Kî wê bikaribê bighije wan zanyariyên ku tu tomar dikê?

Rêveberiya Entegrasyonê û Pirrengiyê (IMDi) berpirs e ji zanyariyên derbara jêhatinên te de. Her wusa IMDi navê te û hejmara te a DUF tomarkiriye, da ku em bikaribin zanyariyên te nasbikin.

Navendên Şewirmendiya Pîşeyî (Karrieresentre) ku girêdayî şaredariya parêzgehê ne wê liser bingeha zanyariyên li ser jêhatinên te de şewirmendiya pîşeyî pêşkêşî te bikin. Eger tu mafê mayinê bistînê û di grûpa armanckirî a programa amadeyî de bê, wê maf û erkê te hebê ku tu programa şewirmendiya pîşeyî biqedênê. Wê şewirmendekî pîşeyî zanyariyên te bikar bînin da ku ew baştirîn şewirmendiyê liser kar û xwendinê li Norwêc pêşkêşî te bikê. Şewirmendê pîşeyî wê encama rêberiyê/şewirmendiyê bi şaredariyê, IMDi û NAV re parve bikê.

Rêveberiya kar û Xweşaliya Civakî (NAV) dikare zanyariyên te bikarbînin û rêberiya te bikê di derbara derfetên bidestxistina kar de li Norwêc.

Şaredariya ku kempa penaberan lê ye wê zanyariyên di derbara te de bikarbînin da ku ew programekî tam-demî yan jî gavên bihêzkirina guncandinê ên li gorî te amade bikê.

Eger tu mafê mayinê li Norwêc bistîne û bi alîkariya desthilatdarên fermî werê bicîkirin, wê **şaredariya ku tu lê hatiye bicîkirin**, zanyariyên te bikarbînin da ku programa amadeyî (introduksjonsprogrammet), fêrbûna zimanê norwêcî û civaknasiya norwêcî yan pêşniyarên têkildar ên din ku li gorî te ne pêşkêşî te bikê.

Zanyarî dikarin ji boyî **armanacên taybet ên lêkolînê û amaran (statîstîkan)** bêne bikaranîn.

Çi mafên te hene li gorî qaideyên parastina xisûsiyetê

Mafê te heye tu zanyariyên ku liser te tene tomarkirin bibînin.¹ Tu dikare daxwaz bikê ku zanyariyên şaş bêne rastkirin yan rakirin². Mafê te heye tu daxwaz bikê ku zanyariyên liser te neyênê bikaranîn, eger, bo nimûne, tu bawer bê ku ew şaş in³. Mafê te heye tu nerazîbûna xwe liser çarekirina zanyariyan nîşan bidê, eger sedemên te ên taybet hebin. Mafê te heye tu gillih bikê li dijî çarekirina zanyariyan⁴.

Eger tu bixwazê mafên xwe yê ku eleqedarê çarekirina zanyariyên te ne bikarbînin, em ji te dixwazin ku tu têkiliyê bi IMDi re bikê bi rêya vê e-mailê: post@immdi.no, yan jî yekser

¹ Mersûmê giştî derbara parastina datayan, xala 15.

² Mersûmê giştî derbara parastina datayan, xalên 16 û 17.

³ Mersûmê giştî derbara parastina datayan, xala 18.

⁴ Mersûmê giştî derbara parastina datayan 77.

peywendiyê bikê bi berpîrsê xisûsiyetê (personvernombud) yê IMDi re bi rêya vê e-mailê: personvernombud@imdi.no.

Ji boyî zanyariyên zêdetir liser mafên te em te şîret dikin tu biçê malperên Datatilsynet (Dezgeha Parastina Data-yan) <https://www.datatilsynet.no/rettigheter-og-plikter/den-registrertes-rettigheter/>, û danezana xisûsiyetê a IMDi <https://www.imdi.no/om-imdi/personvern/>.

Tomarkirin:

Ez dixwazim jêhatinên xwe tomar bikim.

Ez teghiştîm ka zanyariyên ku ez didim dikarin yan wê ji boyî çî bêne bikaranîn.

Ez naxwazim jêhatinên xwe tomar bikim.

Ez dizanim ku tomarkirina jêhatinên min giring e ji boyî pêşkêşkirina programeke tam-temî ji min re li kempa entegrasyonê. Ez dizanim ku nerabûn bi tomarkirina zanyariyan wê encama wê pêşniyareke pîstir bê derbara rahênanê û xwendinê û şewirmendiya kar û çalakiyan de li Norwêc. Ez dizanim ku netomarkirina jêhatinan heye ku encamên wê hebin ji boyî hîlbijartima şaredariya ku ezê lê bême bicîkirin.